

flashhilat

fanzîna ji fotografîyê dinizile

HEJMAR: 2, ADAR 2019

Mehê carê derdikevim. Kesên dixwazin fotograf û nivîsên wan ên li ser fotografîyê di ser min re belav bin, dikarin wan ji flashhilat@gmail.com re bişînin.

Edîtor: Omer Faruk Baran

Berpirsa Belavkirinê: Leyla Arısoy

flashhilat, HEJMAR: 2

Çapa 1ê: 40 nusxe, Riha - Adar 2019

Çapa 2yan: 50 nusxe, Riha - Nîsan 2019

Çapa 3yan: 100 nusxe, Riha - Gulan 2019

Çapa 4an: 30 nusxe, Dîyarbekir - Îlon 2019

 **flashhilat**  **flashhilat**  **flashhilat.fanzin**

SILAVA EDÎTOR

Piştî hejmara me ya 1ê belav bû û bi qasî hikmê me deng veda, gotin me “Fanzîn belaş in, hûn çawa û çima bi pereyan difiroşin?”, me got “Heta radeyekê em naxwazin fanzîn billikume û bisekine”, gotin me “Wellehîn we karekî pir baş kiriye”, me got “Xwedê bo dîtinê çav çêkiriye”, gotin me “Her tişt xweş e, lê ebat xerab e, lazim e bûçiktir bûya”, me got “Carê wisa derket, qey wê wisa here”, gotin me “Nivîs pir in, bes fotograf kê in”, me got “Ew ne fanzîna fotografan e ya fotografîyê ye”, gotin me “Her meh hûnê çawa derxînin fanzînê?”, me got “Elbet di tarîya tîrbê de fotograf nayên girtin”, gotin me “Hûn kê ne, çi ne, çi kes in?”, me got “Bêguman em ji fotografan çêbûne, emê ber bi fotografan ve herin”, gotin me “Hûn çima fanzînê li kafeyan jî nafiroşin”, me got “Em naxwazin ji nexwendinê zer bibin, birizin, herin me ji @pirtûkakurdî bistînin” gotin me “Navê fanzînê pir zor e”, me got “Hûr bikişîne, kûr bikişîne, navê me mêşîne” flashhilat, di rêka xwe ya fotografîyê de çend rûpelên din teqle dike.

LI BIN GUEGUVA GÎHAYAN – 25

Şükrü Erbaş

çi dibû ma fotografê bînê jî hebûya
fotografê dangan, fotografê valahîyê
ê morîyên li pozê nigan
ê ruhê diqefile...

mirinê ti kes ewqas bi tenê nedihîşt

Werger: Bûbb Evdemûn

KEVNEFOTO



Pêla Mezin

Gustave Le Grey

1857

GAZINCNAME

Rûpeleke Instagramê heye, li hêla me kî miribe fotografê wî/wê diweşîne. Heta ez bimirim ezê tim bi meraq wê rûpelê bistalkînim.

Xelîl B.

Remê piştî mirina bavê xwe Instagrama xwe kir mîna ya mele û miftîyan. Her ro ayetek, her ro hedîsek nizam çî. Hindik maye têde azanê jî bixwîne.

Mem D.

Ku dît ez ji wêde tême, ji dûûûûr de mîna zaroyên heft heşt salî lotik dane xwe, pêrgîna min hat. Min go qey dikê halê min bipirse, lê wî bînamûsî rabû go “Ka te ji min re fotografeke Zerînê anî?” Ew çax va çax e, me silav û merheba ji hev birîye.

Reşîd U.

Rojekê dîsa min gîsin hildaye ez dikim li erdê wê bajom, go “Ka bis bis, bavê min li me dinêri” Rabû berê fotografê li serê me daliqandî da alîyekî din.

Sadulah K.

KÛÇENÛÇE

BBCyê ragihand ku şêniyên Sûka Cremieux a Parîsê êdî ji Instagrameran aciz bûne û bo ketina hindurê sûkê di hin saetên belî de qedexe bibe serî li şaredariyê dane.

Li gor nûçeyê, niştecihên sûkê didin zanîn ku jiber kesên fotografan digirin ew nikarin li balkonên xwe bi rihetî xwarinekê bixwin û kêfên din ên wek westderxistinê li wan diherime.

Niştecih dîyar dikin ku divê li ketin û derketina sûkê derî werin danîn, û dema ro hiltê û diçe ava û di dawîya hefteyê de, ku Instagramer bi piranî wan saetan û wan rojan fotografan digirin, ketina hindur sûkê qedexe be.



#cremieux

KEMÎNA MITRIBÊ METHAN

Perxudres

Derengê şevê, min vekir ez dîsa ketim profîla wê. Bi tirsê ez dikim yekê bi şaşî bicibînim min carek din yek bi yek li wêneyên wê nihêrîn û hinek şiroveyên li bin wan xwendin: Kitêbên jê hez dikir, navên pisîkên wê, û derên lê gerîyabû û gelek agahîyên din di demeke pir kin de ketibûn destê min û min nîyet lê xerab kiribû. Hem qinyata min hema hasil bûbû ku jinika navsere hîn mêr nekiriye û bi çend gotinên bi emoji dikare derîyê şahîya yekşevî veke. Min dîrekt jê re binivîsanda dikaribû ez asteng bikirama, “A baş” min got, “Heta ew storyekê belav dike ez li bendê bimînim.”

Rojek, du roj sê roj; ne wêneyek par vedikir ne storyek. Ne ku nedikete Instagramê, diketê. Min ew di lîsteya kesên li storya min niherîne de, di rêzên pêş de didît û min zanibû ku ew jî ji roya ku daxwaza min a şopandina qebûl kiriye vir ve min ji nêz ve dişopîne, çinku di lîsteya kesên li storyên min nihêrîne de tim li rêzên pêş bû û guman dida.

Rojkê dîsa ez bênesîb di Instagramê der çerx dibime, min dît ji nişka ve di lîsteya storyê de hat serê pêşî. Min hema vekir û li storya wê nihêrî: Fotografê keçikeke kirassor û li pişt wê li ser dîwarekî nivîsek:

Şaîr im

Qereçiyê pesnê çavên te

Gulsumakê

Her tişt li nav hev ket li ber çavên min. Fotograf ê kê bû, keçika kirassor kî bû, ew şîr ma ya Gulsumakê bû, rê hebû ku ez bi vê esera kolektîf biçûma ser wê? Min xwe ranegirt, serê xwe jî pir nêşand û bersivek li storya wê veda: “Çiqas fotografekî xweşik e, ne wisa?” Bersiva min tavilê dît lê bersiv nehat. De min zanibû, hinek xanimên xwe giran dikin, dereng li mesajan dinêrin û gava Instagram delîla dîtina mesajê bi çavikekê îşaret dike jî, pir paşê, dûre dûre bersivê didin. Xuya bû ez dikira çend royan jî li bendê bimama ku kevok ber bi teneyên di kemînê de were: Wê kevokê zanibû ku goştê wê pereyan dike û dinazenûzand.

Bes tişteki din, elelecêbek, hevalên me yên hevpar qet tunebûn. Jixwe gava min kemîn vedida, min bala xwe dida ser nebûn yan kêmbûna hevalên hevpar. Jiber ku li dû Facebook, Twitterê, di dewra Instagramê de jî Kurmancîxwende pir hindik bûn û wan jî hema bêje hemûçkan hevdu nas dikir û hez û hembêzên gelek kesan li hev hatibûn mehr kirin û yek ji yekî biçûya yekî yan yek ji yekê biçûya yekê ewqas nedibû meseleyeke giran a namûsê. Bes min dixwest ez dûrî wê civata ti tehm têde nemeya herim û eklên nû yên derdora me nêzîkê nebûye nas bikim.

Bi qasî saetekê bi şûnde min çend teneyên din avêtin kemînê: “Ez jî rahijim kemaçeyê û bibim mitribê methên te?” min ji wî fotografê wê par vekiribû re nivîsî îcar. Kevoka navsere ya çav li teneyan ketibû yan dikira bihata nav çadiran yan jî dikira ez asteng bikirama pir pir. Gava bersiva bi “:)” hat, min zanibû ezê heyfa bersiva wê ya dereng jê rakim. Heta ku şeva dîtir, hin herfên wê wê guhên min derbaz dikirin û diçûn cîranan: “Ox, owwwwwwwwwwwwaaaaawwwwwwwwwwwwwwwwwx”

JI DEVÊ WÊNEKARÊ NAVDAR

Sîna Silokoro

Ez Metîn im. Metîn, kurê Çetînê Hamed. Eslê fêslê me em kî ne, em ji Deklanşoran e. Bajarê me gundê me, em ji Çalêleîca ne. Vêca ew hidûdê hanê nebû keko, maleke bavê min li Kodaxanê bû yek li Fujidelê. Çilo mesela, em ji kê elimîn vê hunera fotografê mesela, em ji bavê xwe elimîn.

Mamed ewil fotograf nedişixuland, ewil firçe û boyaxên wî hebûn. Piştî elimî fotograf û elimî wê hunerê bû fotografçi. Mamed zû bi ser ket. Weke niha mesela ez ne tenê fotografan digirim. Ez fotografan digirim, ez tabloyan çêdikim, ez vîdeoyan hazir dikim. Yanî kar nîne ku ez nizanim çêkim.

Xwedê Teala ez li Nîvkonê dame. Di kîjan salê de, di 92yan de Xwedê Teala ez dame. Te dî berê kursên fotogran nebûn, kamera nebû, ez wilo zen dikim, di 98an de me destpê kir. Bavê min diçû şahîyan, dawetan, civatan, koşka camêran weka haziran em pê re diçûn. Em elimîne vê hunerê.

DÎYALEKTÎKA MELAYÊ CIZÎRÎ, GUHERÎNÊN CIVAKÎ Û WEK ERK PÊVEDANÊN STORYAN

Şemzîn Zankademî

Afirandinên fotografîk pir caran li ser hîma dîrokî ya civaka xwe ava dibin. Heke ev afirandin, mîna di nîmûneyên Amerîka de, li ser bingeheên postkolonyal û teknîkên klasîk durist bûbe, fotografên dîrokî dê teqez di hunerê de cîhê xwe bigire. Fotografên ku di vê çarçoveyê de peyda bûne heya dereceyekê hilberînên civakî yên wek storyan diafirînin. Ev story di derxistin û dûrxistina tesbîta mafdarîyê de cîhekî girîng digire. Di hin helbestên Melayê Cizîrî de aşiq, di vir de ji peyva “aşiq” qest civak e, gelek klîşeyên berovajîbûyî dide ku bi wan pêdeçûn û piştrastkirina storyan derdikeve holê. Cizîrî hîn berî fotograf bi destê Rojava li dijî Rojhilat were karanîn, ronahî nivîsîye.

***rohnîya wê şewq û tavê
şerbeta qend û gulavê
kes nehin mehrûm ji navê
lê tenê bo min xela ye***

Ew çar rêzikên Cizîrî bo destnîşankirina ronahîyê têra xwe balkêş e. Sedema sereke ya vê balkêşbûnê ew e ku aşiq raçav nebe jî yara ku bi fotografên di storyê de dide hin kesan û xwarin dide, aşiqî di xelayê de bi tenê dihêle. Têbînî, tesbît û têtîlîyên “xela”yê bi formên tenêbûnê ve ne girêdayî ne, lê Cizîrê digihê wê qenaetê ku di tarîyê de storyên tazîyan pêk nayên û bo ronahîyê jî şêweyên şerbetan yên qend û gulavan pêwîst in.

Çarenûsa Cizîrî ligel serhatîya aşiq û bandora jîngehê li ser storyan, ji taybetmendîyên berçav ên bo kîmyaya fotografan e. Cizîrî bi wesfdana yarê wesîqayekê çêdike û jî hê gelek berî fotograf were afirandin, kamerayê dide ser storyan.

dem bi dem ew çehvenêr e

bête nîşanek me jê re

da bibit ew zinde vê re

yarê sadiq bêbiha ye

Ji van nimûneyan tê fêmkirin ku Cizîrî bi armanca berevanîya pîrozbûna eşqê buhayek çêkiriye û berî sedsalan daye zanîn ku hin story pergabelavker in.

Bandora arîşeyên storyan a wêranker, pêvajoya
veqetînê dide lezê û ji pesendkirina wan re dîsa
derfetan diafirîne. Cizîrî bo bîrokîya eşqî
diyardeyên jîyanê ji dest nebin, hilm û
hestîyarîyeke otantîk vedibêje. Bi vî rengî,
hêmanên cuda eşqê berçav dikin. Ligel vê
dabînkirinê girîngîya li ser yekyarîyê pûç dimîne.
Tevî venasîna çandî ya ku fotografan divê aloztir
bike, perspektîfeke nû nade yekyarîyê. Hizerîna
yekê/î li gor Cizîrî fotografekî rasteqîne ye. Aşiq
gava bi toleransa ronahîyê re rû bi rû dimîne,
kameraya wî/ya îro li rabirdûyê dinêre. Ew
atmosfera dikare bibe mînak ji hişmendîya aşiqî re,
lê Cizîrî di dawîya helbestê de dawî li nîqaşan tîne.

çendekê sadiq cema bin

er bibêjî can fida bin

wek Melê lazim tu nabin

wî ji dil canê xwe daye

*Jiber dirêjîya lîsteya çavkanîyê, flashhilatê ew
neweşandîye û ji nivîskarê xwe û xwendevanan
lêborînê dixwaze.

HESABEKÎ INSTAGRAMÊ: @gavurmahallesi

Li Instagramê yek ji hesabên herî populer ên Dîyarbekirê, **@gavurmahallesi** ye. Hesab, fotografên kevn ên Dîyarbekirê belav dike û car caran bi alîkarîya şopînerên hesêb, cîhên fotograf lê hatine girtin tesbît dike. Me ji rêvebirê hesêb, Ahmed Ölker, çîroka berhevkirin û belavkirina fotografên kevn pirsî û wî bersivand.

Çawa destpê kir meraq û çîroka berhevkirina van fotografên kevn ên Dîyarbekirê?

Ti fotografên min ên li ser zaroktîya min a li Sûrê tunebûn. Meraqa min, bi lêgerîna fotografên min ên zaroktîyê destpê kir. Min li ba nas û dostên me pir zêde tiştê nedît li ser zaroktîya xwe, fotografên wan ên din jî li ba min wek yadîgar man.

Ma tenê bi fotografên li ba nas û dostan te ewqas fotografên kevn top kir?

Car caran li ba nasên me, car caran fotografên hevalên ez diçûm malên wan û her wekî din. Yek caran ji mezatan, ji koleksiyoneran, yê min


pereyan kirîn jî hebûn. Ew kar hêdî hêdî ji hez û hobîyekê zêdetir bû wek erkekî. Ku yekî fotografên kevn didît berî herkesî ji min re dişandin û dixwest ku ez wan binirxînim. Ji her derê fotografên kevn derdikevin. Çend roj berê ez çûbûm Îzmirê, li wir di nav kitêban de min albumeke Yahudîyên Dîyarbekirê dît. Li ser Yahudîyên Dîyarbekirê çavkanî pir kêr in, ew li wir bû.

Şopînerên hesabê we jî ji we re fotografan dişînin, ne wisa?

A rast me xwest em bi şopîneran karekî kolektîf bikin, me got belkî fotografên balkêş derkevin. Lê bi piranî fotografên li girtîgehan hatine girtin ji me re hatin şandin, me fotografên şopîneran rawestandin. Ji meyxaneyan heta gelek cîhên din, zêde zêde fotograf hatin, lê me rawestand. Çinku em mecbûr bûn hemî fotografan biweşînin. Jixwe arşîva min bi xwe tenê bo Instagramê têra 10 – 15 salan dike.

Çiqas fotograf heye di arşîva te de?

Bi qasî 57 hezar.



@gavurmahallesi

Ji kîjan salê heta kîjan salê 57 hezar?

Wiha bibêjim, ji 1880an destpê dike heta 2002yan. Hema bêje temamê fotografên di navbera 1980 û 2000î min ji turîstan sitandin. Min ji foruman, ji malperên hevaltîyê berhev kirin. Ew hinekî jî meraq e. Min navê Dîyarbekirê bi 26 zimanên cûda li Googleê nivîsî û ez li fotografan gerîyam.

Ji malperên hevaltîyê, foruman kes li te vegerîya?

Mesela tiştê balkêş e, li vê derê Bingeha Pirinçlikê ya NATO hebû berê. Min berê ji mezinên xwe bihîstibû ku kesên ji Amerîka hatine li vir xebitîne, di destan bi makîneyên fotografan digerîyane û fotografên însanan digirtine. Min di internetê de forumeke hevaltîyê ya Pirinçlikê dît. Karmendên li wir xebitîne bo hevdu bibînin malperek vekirine. Min ji wan hemûyan re mail şand û fotografên wan ên li Dîyarbekirê girtine xwestin. Yekî ji Teksasê bersiv ji min re şand. Şok bûbû, piştî 50 salan yekî ji Dîyarbekirê ew anîbû bîra xwe. Him şaş bûbû him jî kêfxweş bûbû. Wî hinek fotografên rengîn yê sala 1950yî şandin.

Tu vê arşîvê tenê bi awayekî dijîtal diparêzî?

Na, 40 ji sedê vê arşîvê bi tamamî belgeyên orîjînal in. Ew hatine tasnîf kirin û bo wan jelatînên taybet hatine çêkirin, hewayê nastînin. Ez bo xwe bêjim, bo min gelekî bi qîmet e ew arşîv û ez baş diparêzim. Ewên din ên dijîtal hene, ên ji muzeyan hene, lêkolîner, nivîskar, rojnamevan, fotografên ku me ji wan sitandine hene.

Gava te ev arşîv berhev kir û li ser Instagramê belav kir, tu qet li çîrokên balkêş ên fotografan rast hatî?

Dema me rûpela xwe nû vekiribû min fotografek weşand. Fotografekî kevn ê jineke Ermenî, ji Dîyarbekirê koç kiriye. Fotograf li Sûrîyê hatiye girtin. Nevîyê wî yê li Amerîka ji min re nivîsand. Got ew pîrika min e û got min berê ti fotografên wê nedîtine û jina ku qala wê dikin ew e. Got min bi saya we pîrika xwe dît. Min orîjînalê wê fotografê ji Amerîka re şand, ne kopya, orîjînalê wê min şand.



Li gor agahîyên Ahmed Ölker dide jinika di fotografê de Marta Basmacıyan e û fotograf di 1946an de li Sûrîyê hatiye girtin. Ölker dîyar dike ku di 1915an de 9 zarok û mêrê Marta Xanimê hatine kuştin; ew bi çar zarokên xwe yê mayî ji Dîyarbekirê revîyaye.

Ne eyb e meriv bipirse, ê te ew fotografa ji kû sitand?

Ew fotograf di ser nasekî re gêhişt min. Cîranekî nasekî min ê li Sûrê dabû wî. Ew ji mal derketine çûne û piştî ew ketine hindur wê malê.

Albumeke fotografan dîtine. Piştî 40 salan ew fotograf ket destê min.

Di vê heyamê topkirina fotografên kevn de ji te tişteke guherî?

Hevalên min guherîn. Min ferq kir ku ez bi kesên temenê wan li dora 60-70 ye hevaliyê dikim.

Dîyalog guherîn. Pirtir kal û pîr kêfxweş in bi vê rûpela me, çinku di wan fotografan de ew rojên berê dibînin.

Pirsa min a dawî, di nav ewqas fotografan de çi ye bo te wateya fotografan?

Li ser girtina fotografan meraqa min tune. Ez zêdetir dixwazim ku bîranînan berhev bikim.



Li Dêrezora Sûrîyê zarokek li kamerayê dinêre.

Foto: Rodi Said/Reuters